

Cild:2

Hejmar:2

Çirîya Pêşîn 2021

folklorûziman

Kovara Akademîk û Navneteweyî ya Xebatên Kurdî
International Academic Journal of Kurdish Studies

ISSN: 2667-6435



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ

Edîtor

Doç. dr Mustafa Aslan (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Mikail Bûlbûl (Weqfa Mezopotamyayê - Tirkîye)

Lijneya Edîtorîyê

Prof. dr Celilê Celîl (Institut für Kurdologie - Awisturya)

Dr Mehmet Tayfun/M. Malmîsanij (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Hemin Omar Ahmad (Zanîngeha Soranê - Kurdistan / Îraq)

Dr Necat Keskin (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Ramazan Pertev (Zanîngeha Rouen Normandîyê - Fransa)

Lijneya Şêwirmendîyê

Prof. dr Ebdulwehab Xalid Musa (Zanîngeha Newrozê - Kurdistan / Îraq)

Prof. dr Sabah Reşîd Qadir (Zanîngeha Raperînê - Kurdistan / Îraq)

Prof. dr Farûk Îsmail (Frei Universität Berlin - Almanya)

Prof. dr Şukrîye Resûl Îbrahîm (Zanîngeha Tîşkê - Kurdistan / Îraq)

Prof. dr Tahirhan Aydın (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Prof. dr Bahîz Omar Ahmed (Zanîngeha Duhokê – Kurdistan / Îraq)

Doç. dr Bextiyar Secadî (Zanîngeha Kurdistanê - Îran)

Doç. dr Mehmet Zahir Ertekin (Zanîngeha Bîngolê - Tirkîye)

Doç. dr Mustafa Öztürk (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Shahab Valî (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Süleyman Şanlı (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Canser Kardaş (Zanîngeha Mûşê - Tirkîye)

Dr Abdurrahim Özmen (Zanîngeha Dîcleyê - Tirkîye)

Hekemên Vê Hejmarê

Prof. dr Tahirhan Aydın (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Doç. dr Canser Kardaş (Zanîngeha Mûşê - Tirkîye)

Dr Hemin Omar Ahmad (Zanîngeha Soranê - Kurdistan / Îraq)

Dr İbrahim Tarduş (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Kenan Subaşı (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Mikail Bülbül (Weqfa Mezopotamyayê - Tirkîye)

Dr Necat Keskin (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Ramazan Pertev (Zanîngeha Rouen Normandieyê - Fransa)

Ji Edîtoran

Em kêfxweş in ku bi hejmara çarem ya kovara Folklor û Zimanê li pêşberî we ne. Folklor û Ziman ku di bin banê Weqfa Mezopotamyayê da, salê du caran (nîsan û çirîya pêşîn) derdikeve û kovareka bihekem û navneteweyî ye. Di kovarê da xebatên akademîk yê li ser folklor û zimanê kurdî cih digirin. Zimanê gotaran, ji bilî kurteyên îngilîzî, bi temamî kurdî ye.

Di çerçoveya folkora kurdî da mijarên wekî teorîyên folklorê, edebîyata gelêrî, adet û tore, bîr û bawerîyên gelêrî, zanyarîyên gelêrî, ferhenga herêmi, têgehên folklorê kurdî, xebatên meydanî û herweha lêkolîn û nivîsên derbarê etnografyaya kurdî da û hwd dihên weşandin. Di çerçoveya xebatên zimanî da jî her cure mijarên têkildarî fonolojî, morfolojî, sentaks, morfosentaks, zimannasîya civakî (sosyolînguîstîk), zimanzanîya îranî hwd cih bigirin. Di kovarê da dê nivîsên di forma gotar, wergêran, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan da jî biweşin.

Em hêvî dikin ku Folklor û Ziman bibe yek ji çavkanîyên akademîk û zanistî û alîkarîya lêkoleran bike. Bi taybetî piştî ku di van salên dawî da li çend zanîngehan beşên kurdî yê lîsansê û masterê vebûn, hem geşebûnê xurt ya asteka akademîk çê bû hem jî bi qasî wê pêwîstî bi xebatên bi vî rengî zêdetir bû. Loma jî ji bo xebateka bi vî rengî motîvasyonek peyda bû û niha em bi hejmara çarem li pêşberî we ne.

Di vê hejmara çarem da gotarên zanistî, wergêran, analîza berheman û nîrxandina pirtûkan hene. Em dikarin bi kurtî wan weha vebêjin:

Yasin Duranî di gotara xwe ya bi navê “*Analîza Çîroka Mihemed Begê Spîvanîyê li gor Çar Fonksîyonên Folklorê yê William R. Bascomî*”yê da, bi xebateka sehayî hem çîroka “Mihemed Begê Spîvanê”yê qeyd û deşîfre kirîye û hem jî analîza wê li gor teorîya William R. Bascomî kirîye.

Şukrî Yilmazî di gotara xwe ya bi navê “*Zêmarên Kurdî yê Kafkasya û Herêma Mêrdînê: ji Hêla Teşe, Naverok û Zimanî ve*”yê da, bi materyalên her du herêman, naverok, teşe û zimanê zêmaran, berawird û analîz kirine û li gor keresteyên ku li ser xebitîye, hin tesbît kirine.

Lokman Kalanî di gotara xwe ya bi navê “*Dem di Devoka Torê da*”yê da, li ser materyalên sehayî yê devoka Torê, bikaranîn dem û xuyangên rêzimanî analîz kirine.

Akademîsyen Mustafa Aslan û Ayhan Yıldız di gotara xwe ya bi navê “*Nirxandina Kurteçîrokên Mela Mehmûdê Bazîdîyî yê bi navê Durru’l-Mecalîsê*”ê da, hem li ser jîyan û giringîya Mela Mehmûdî sekinîne hem jî 84 çîrokên ku di arşîva destxetan ya Aleksandre Jabayî da peyda bûne, ji çend alîyan ve analîz kirine.

Di vê hejmarê da, me gotareka wergêrayî jî çap kir. Gotara Yaron Matrasî ku ji bo rêzimana kurmancî xebateka giring e û bi îngilîzî hatibû nivîsin ji hêla Umran Altinkiliç û Sinan Gultekînî ve hatiye wergêran.

Di beşa nirxandina pirtûkan da jî du pirtûkên hêja hene. Yek jê ya Deniz Gunduzî ye ku li ser zimanî hatiye nivîsin û berawirdîya zimanê avestî û kîrmanckî dike û xebateka etîmolojîk e, ji aliyê Pinar Yıldızê ve bi diyalakta kîrmanckî hatiye nirxandin. Ya din jî pirtûka Dîyarî Asûrê ye ku xebateka berhevkarîyê ye û li ser çîrokên herêma Êlihê ye. Ev pirtûk jî ji aliyê akademîsyen Ayhan Yıldızî ve hatiye nirxandin.

Ji bo vê hejmarê jî gelek kesan ked dan û alîkarîya me kir. Bi taybetî em spasîya hemû hekeman dikin ku bi xêra wan û têbînîyên wan gotar gelekî baştir bûn.

NAVEROK

Gotar

Analîza Çîroka Mihemed Begê Spîvanîyê li gor Çar Fonksîyonên Folklorê yê William R. Bascomî

Yasin Duran159-184

Zêmarên Kurdî yê Kafkasya û Herêma Mêrdînê: ji Hêla Teşe, Naverok û Zimanî ve

Şükrü Yılmaz185-211

Dem di Devoka Torê da

Lokman Kalan213-242

Metin - Analîz - Deşîfrasyon

Nirxandina Kurteçîrokên Mela Mehmûdê Bazîdîyî yê bi Navê Durru'l-Mecalîsê

Mustafa Aslan - Ayhan Yıldız245-264

Wergêran

Temamkirin di Kurmancîyê da: Alîyên Semantîk-Tîpolojîk, bi Perspektîfeka Herêmi

Yaron Matras (Wergêran: Ümran Altınkılıç - Sinan Gültekin)267-287

Nirxandina Pirtûkan

Kitabê “Avesta Dili ile Kırmancca (Zazaca)’nın Karşılaştırılması: Etimolojik Bir İnceleme” Ser o

Pınar Yıldız291-294

Nirxandina Pirtûka “Kûçikê Daleqandî”yê


Ayhan Yıldız295-298

KITABÊ “AVESTA DİLİ İLE KIRMANCCA (ZAZACA)’NIN KARŞILAŞTIRILMASI: ETİMOLOJİK BİR İNCELEME” SER O

Pınar Yıldız*

Nuştox Deniz Gunduz bê şîre, hikaye û romanên xo gramerê kirmanckî ser o zî xebitîyeno, ey açarnayîşî zî kerdê. Yanî nuştox Gunduz kedkarêkê kirmanckî yo. Gunduzî tezê xo yê masterî Unîversîteya Mardîn Artuklu de beşê kurdî de qedîna. No tez serra 2020î de sey kitab Weşanxaneyê Vateyî ra bi nameyê “*Avesta Dili ile Kirmancca (Zazaca)’nın Karşılaştırılması: Etimolojik Bir İnceleme*” vejîya. Na xebata etimolojike de Gunduzî zîwanê avesta û kirmanckî dayo têver. Seba ke destanê ma ver de metnê nuştekiyê zaf kehen yê kurdî çin ê yew prototîpê kurdî vetiş zehmet o. Yanî kurdîya kehenê tespît kerdiş, prosesê zîwananê Îranîyan ra aqitîyayîşê aye û mîyanê xo de şax bi şax sey dîyalektan abirîyayîşî tespît kerdiş zaf zehmet o. Coka ewro munaqeseyê sey gelo kirmanckî yew şaxê kurdî yanî yew dîyalektê ci yo yan kurdî ra xoser yew zîwan o, estê. Zîwanê avesta sey prototîpê zîwanê kurdî hesabîyeno. Coka xebatê ke zîwanê avesta ser o benê, bîlhesa xebatê ke zîwanê avesta û kurdî bidê têver muqayese bikê, seba kurdolojîyê muhîm ê û xebatê winasî do beranê neweyan ma ver o akerê. Ewropa de zîwanê avesta ser o zaf xebatî bibê zî heyf ke tîya de ma hema zî wayîrê yew lîteraturê xurtî nîyê ke bîlhesa zîwanê avesta û kurdî bidê têver. Tore Sivriogluyî xebata xo de yew çarçewayê zîwan û gramere avestakî û ferhengêko etimolojîk amade kerdo. Qismê ferhengî de ca-ca ca dayo kurdîya (kurmanckî, zazakî) çekuyan zî. Na xebate de amanco sereke helbet muqayesekerdiş û têvernayîşê kurdî û avestakî nîyo û zazakîya çekuyan de ge-ge xeletî, ge-ge zî kêmasî estê. (Sivrioğlu, 2015). Pergalê ferhengnasîyê kurdî de zî zîwanê îranîyê kehenî û kurdîya ewroyî muqayesekerdiş zaf zêde çin o. Malmîsanîjî yew ferhengê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî amade kerdo. Peynîya na xebate de nuştoxî di rîpelî ferhengokêk kirdkî-avestakî-kurmanckî zî amade kerdo. (Malmîsanîj, 1997).

* Vekoler, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Zanîngeha Mardîn Arttukluyê.
E-mail: pinariyildiz@hotmail.com



Xebata Gunduzî zî nê wareyî de sey destpêkê yew teşebusê neweyî yo. Helbet nê wareyî de xebitîyayış zehmet o. Çike etimolojî bi xo yew warêko giran û hesap o. Wexto ke nê xebatî kîrmanckîya ke ewro destanê ma ver de metnê ci yê kehenî çin ê ser o bibê, no kar hîna giran beno û mesela hîna bena hesap. Seke yeno zanayış yew ferhengê etimolojik yê kîrmanckî çin o.

Malmîsanij xebatanê xo yê ziwannasî de zafî reyî bi metodê muqayeseyinî xebitîyeno, dîyalektanê kurkî dano têver (Malmîsanij, Lehçeya Hewramkî (Gorankî) Ra, 1999), (Malmîsanij, Lehçeya Hewramkî (Gorankî) Ra-II, 1999) û etimolojîyê kîrmanckî ser o xebitîyeno. (Malmîsanij, Ver Bi Etimolojîyê Kîrmanckî (Zazakî), 2000), (Malmîsanij M. , Kîrmancca Etimolojisine Doğru-I, 2020), (Malmîsanij M. , Kîrmancca Etimolojisine Doğru-II, 2021), (Malmîsanij M. , Kîrmancca Etimolojisine Doğru-III, 2021), (Malmîsanij M. , Kîrmancca Etimolojisine Doğru-IV, 2021).

Gunduzî zî bi na xebata xo destê xo kerdo binê kerra û waştê ke kêberê nê karê giran û hesapî ra bivîyaro. Na xebate destpêkêk û çar beşan ser o awan bîya. Destpêkê de nuştoxî behsê xebatanê ke heta nika Avesta û Îranolojîyî ser o bîyê kerdî. Dima bi kilmîye behsê amancê xebata xo, metodê ci, sînoranê ci kerdo. Nuştoxî seba amancê xebata xo vato ke “Amancê nê tezî çarçewayêka sînorkerda de kîrmanckî û zîwanê avesta muqayesekerdış o, bi nê şekilî ma do mabênê nê zîwanan de eleqeyêko senîn esto tespit bikê û vîyarteyê kîrmanckî roşn bikê.” (Gündüz, 2020).

Beşê yewinî de nuştoxî zîwanê avesta û kîrmanckî hetê fonetîkî ra muqayese kerdo. Bi nê muqayesekerdışê fonetîkî merdim derheqê kokê çekuyan û bedilîyayışê înan de beno wayîrê yew fikrî. Qayîdeyanê kehenanê bedilîyayışê vengî ser o zî beno wayîrê zanayîşî.

Beşê dîyînî de nuştoxî hetê zemîran ra ziwanê avesta û kirmancî dayê têver. Nuştoxî dîyalektê kurdîyê bînî, goranî, soranî û kurmanckî zî daxîlê nê muqayesekerdişî kerdê. Seke yeno zanayîş na babete de mabênê nê dîyalektan de cîyayî estê. Sey nimûne sorankî de gruba dîyina zemîran çin a. Yan zî mabênê kurmanckî û kirmancî de hetê nêrî û maki ra tayê ferqî estê. Merdim nê ferqan bi çimeyê esasî yanî ziwanê avesta reyde eşkera vînenê.

Beşê hîrêyînî de nê her di ziwanî hetê karan (fîlan) ra ameyê têvernayîş. Beşê çarinî de zî yew ferhengê ziwanê avesta amade bîyo. No ferheng kirmancî, avestakî, îngilîzkî û tirkî amade bîyo. Merdim bi saya nê ferhengî seke maya çekuyanê ke xo o wext ra parêznayo û sey yew mîrasêkê qedîmî heta ewro resayê eşkera vînenê. Nuştoxî xebata xo bi qismê peynîye (netîce) qedênaya û çimeyê xo rêz kerdî.

Ma hêvî kenê ke na xebata erjaya seba zafê xebatanê winasîyan biba yew nimûne û çime. Çike ancax bi saya xebatanê winasîyan ma do tarîxê ziwanê xo hîna weş fehîm bikê û munaqeseyanê gelo kirmancî dîyalektêk yan ziwanêk o bi şekilêkê hîna îlmî munaqese bikê. Sey nimûne Gunduzî meqaleya xo ya ke bi nê metodî nuşta de îtirazê şemaya kokê ziwananê Îranîyan yê Joost Gippert û Ludwig Paulî kerdo. (Gündüz, Tarihsel ve Fonetik Bakımından Kırmancca ve Kurmancca, 2020). Na meqale û no kitab wexto ke pîya bêrê wendene yewbînan tamam kenê û hîna baş yenê fehîmkerdene.

Çimeyi

- Gündüz, D. (2020). *Avesta Dili ile Kirmancca (Zazaca) 'nın Karşılaştırılması: Etimolojik Bir İnceleme*. İstanbul: Vate.
- Gündüz, D. (2020). Tarihsel ve Fonetik Bakımından Kirmancca ve Kurmancca. *Yazınsal Varoluştan Akademik Literatüre Kirmancca (Zazaca)*, M. Malmîsanija Armağan (s. 107-149). içinde İstanbul: Vate.
- Malmîsanij. (1997). *Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî*. Stockholm (?): Apec.
- Malmîsanij. (1999). Lehçeya Hewramkî (Gorankî) Ra. *Vate*(7), 4-32.
- Malmîsanij. (1999). Lehçeya Hewramkî (Gorankî) Ra-II. *Vate*(8), 33-57.
- Malmîsanij. (2000). Ver Bi Etimolojîyê Kirmanckî (Zazakî). *Vate*(11), 33-37.
- Malmîsanij, M. (2020). Kirmancca Etimolojisine Doğru-I. *Vate*(66), 47-67.
- Malmîsanij, M. (2021). Kirmancca Etimolojisine Doğru-II. *Vate*(67), 29-51.
- Malmîsanij, M. (2021). Kirmancca Etimolojisine Doğru-III. *Vate*(68), 31-67.
- Malmîsanij, M. (2021). Kirmancca Etimolojisine Doğru-IV. *Vate*(69), 31-64.
- Sivrioğlu, T. (2015). *Avesta Dili ve Etimolojik Sözlüğü*. İstanbul: Avesta.


NIRXANDINA PIRTÛKA “KÛÇIKÊ DALEQANDÎ”YÊ

Ayhan Yıldız*

Dîyarî Asûr panzdeh çîrok ji nav gelî berhev kirine û navê çîroka “*Kûçikê Daleqandî*”yê ku di rêza sêyem da cih digire, li pirtûkê danîye. Weqfa Mezopotamyayê ev xebat di 2019an da li Stenbolê çap kirîye. Pirtûk cara yekem e ku di hê çapkirin, edîtorê wê Bahoz Baran e û hejmara rûpelên wê 176 e. Amadekarê pirtûkê Dîyarî Asûr di sala 1987an da li Êlihê hatîye dinyayê. Wê li di Zanîngeha Çukurovayê da, beşa Fîlozofîyê xwendîye. Li gor ku di pêşgotina pirtûkê da hatîye dîyarkirin, wê jî di nav komeka xebatkarên folklorê da di sala 2017an da perwerdeya karê folklorê dîtîye û di pey ra dest bi karê berhevkirina van keresteyan kirîye. Ji agahdarîyên hundirê pirtûkê dîyar dibe ku ev xebata nivîskarê, ya pêşî ye.

Herçiqas gişt wekî “çîrok” yaxud “xeberoşk xuya bibin jî, hinek di nav wan da dikevin bin banê metinên pêkenîyan.

* Hindekar, ayhanmeretowar21@gmail.com



Çîroka pêşî *Timayî .. bi Însana Dide Xwarinê*, li ser dehşet û xeşyeta xuya xerab a çikûsiyê ye. Padîşah ji wezîrê xwe ra dibêje divê tu hîn bibî bê ka li dinyayê tiştê herî pîs çi ye û werî ji min ra bibêjî. Wezîr bi dinyayê dikeve û li bersivê digere, heke neîne dê bihê kuştin. Wezîr rojekê li ber erdê cotyarekî ye û kûpekî mezin di ber gîsnê wî da derdikeve. Ew jî alîkariya cotyarî dike, kûpî derdixin ku zêr e. Wezîr lê tima dibe û doza şîrîkatîya zêran li cotyarî dike. Di pey nîqaşeka tund ra cotyarî, bi şertê ku wezîr gûyî bixwe razî dibe.

Wezîr ji bo zêran xwe dide ber vê kiriyara xerab û kêlîya ku dike vê bike, cotyarî çawa gava di ber xwe da dibêje “mala minê, yahû li vê dunyayê ji timatîyê pîstir tiştê tune ye”, Wezîr bi ser hemd û hişê xwe ve dihe û demildest hal û meseleyê xwe jê ra dibêje.

Çîroka “*Mele Çivî*”yê, ji pêkenîyeka balkêş pêk hatiye ku rewşa civakî ya xelkê nîşan dide. Pîreka rênçberêkî bi konetîyekê zîlamê xwe dike mela û rêzerûdanên komîk dest pê dîkin. Çîroka “*Kûçîkê Daleqandî*”yê, rûdana şivanek û kûçîkê wî yê sadiq ku bi xapandina gurekî dibe xayîn vedibêje. Çîrokbêj, ji devê “gur”ekî xayîntîya rêvebirên dewletêkî ji kûçîkî ra vedibêje. Kûçîkê sadiq, bi gotinên gurî bawer dike, pê dixape û jê ra misade dike ku rojê li pezekê bide û peyra jî îca ew here bermahîyên wî bixwe. Şivan bala xwe didê ku guhertinek di kûçîkê wî da xuya dibe. Lewra ew kûçîkî ji nêz ve dişopîne. Bala xwe didê ku wa ye gur û kûçîk pevra diaxivin û ji wan fîm dike ku çi dibêjin û pevra çi karekî kirêt dîkin. Êvarê gava şivan pez diîne malê, kûçîkê xwe diqefêle û bi serserkî dadiliqîne. Padîşah û wezîrê hingê jî bi tebdîlê qîyafet dihen ber derê vî şivanî û kûçîkê daleqandî bala wan dikêşe û ji wî dipirsin bê ka ev çi mesele ye ku te ev kûçîk weha daleqandîye. Ew ji wan ra nabêje, peyra padîşah vedigere payîtextê û bi darê zorê şivanî diîne meqamê xwe. Şivan li wir jî nabêje, wî dizewicînin jî nabêje, peyra padîşah dibêje heyran tu bikeve şûna min û vê razê ji me ra bibêje. Ew jî gava hefteyekê dikeve şûna wî, padîşahê berê di cihekî da ji bo seyr û temaşeyê vedişêre û gazî wezîrên wî dike. Pêşî bi rêya siyasetnasîyê nemisilmanîya her du wezîr, qazî û rêvebirên dewletê deşîfre dike û padîşah bi wan dide hisandin û meseleya kûçîkê xwe pê dide serwestkirin.

Çîroka bi navê “*Çîroka li Ser Qederê*”yê, bi awayekî balkêş merivantîya di navbera çîna serdest û ya bindest da vedibêje. Herçiqas wezîrê padîşah bi derfetên dewletî li dijberî qewimîna qederî ya du ciwanan derdikeve jî, bi ser nakeve. Çîroka bi navê “*Derewçî*”yê rûdaneka balkêş a di navbera yekî derewîn û qazî da, bi awayekî komîk vedibêje. Çîroka “*Xewna Qazî*”yê, fen û fûtên jineka kone derdibire bê ka çi bi serê zilamekî masûm da anîye.

Teşeyê çîroka “*Hesamê Axê û Lalîxan*”ê hem bi awayê pexşankî ye hem jî bi awayê nezmî. Axayek ji birayê xwe Hesam Axa ra Lalîxanê dixwaze û berî ku bûkê biînin, jinapa wan ji ber ku dilê qîza wê ketiye Hesam Axa, naxwaze ev zewac biçe serî. Lewra fesadî dike û Hesam Axa poşman dibe. Çi heye ku birayê wî dîsa jî daweta Lalîxanê dike wê ji bo xwe dide anîn. Di rê da gava Hesam çav bi Lalîxanê dikeve dibe evîndarekî bengî û hişê wî diçerqile. Êdî dibe aşiq û bi dinyayê dikeve. Di dirêjahîya çîrokê da êdî kilam dikevin dewrê û hem Lalîxan hem jî Hesam kilamên dilbîşewat distrên. Piştî rêzerûdanên cîya cîya her du jî bêyî ku bigihîjin hev û din rehmet dikin.

Çîrokbêj berhema bi navê *Kalo û Pîr Fatê*, bi awayê nezmî û pexşanî vegotîye. Lehengê bi navê Kalo di navenda rûdanan da ye û qaremanîya wî mijara çîrokê ye. Bi tevî egîtîyê, pisporîya wî ya di warê sîyasetmedarîya şerî da jî balê dikêşe. Lewra ev berhem bi taybetmendiyên xwe yên naverokî û ruxsarî dişibe cureyê *destanan*. Çîroka “*Stenbolê û Darê Çam e*”yê, rêzeserpêhatîyên du axayan digel qîza padîşahê Stenbolê û qîza wezîrê wî vedibêje. Her çîrokek çîrokeka din vedike û dîyar dibe ku qîza padîşah jî qîza wezîr jî xwedî hêzên ecinî ne. Ev her du axa piştî têkoşîneka dûredirêj heq dikin ku padîşah qîza xwe li axayekî; wezîr jî li axayê din mar bike. Piştî çendakî gava axa digel pîrekên xwe, berê xwe didin welatê xwe, çemekî mezin dikeve pêşîya wan. Dewrêşekî Xwedê jî bi wan ra ye û ji bilî vî dewrêşî gişt bi avê da diçin. Dewrêş her du pîrekan bi saxî xelas dike, lê her du axa wenda dibin. Çîrokbêj di çîroka “*Elo Rûvî*”yê da jîrî, şarezatî, aqilmendî, sîyasetnasî û ramyarîya keçekê ciwan a gavanekî vedibêje bê ka çawa bi alîkarîya rênîşandana dêya xwe li hemberî mêrê xwe ku kurekî bêtêcrube û nezan ê padîşahêkî ye, bi serbilindî û serfirazî li dijberî dijwarîyên jîyanê bi ser dikeve û mêrê xwe ji mirinê xelas dike.

Çîroka “*Fetlûfen*”ê, serpêhatîyên du ciwanên hakimekî vedibêje. Birayê mezin bi awayê bêtêcrube xwe li karûbarên giran qerase dike; lêbelê yê ciwan bi rêya ramyarî, jîrî, çavnasî û şarezatîyê dest bi karûbarên xwe dike. Birayê mezin ji ber nezantî û bêtêcrubetîyê ji canê xwe dibe; lêbelê birayê wî yê ciwan, bi alîkarîya zanetî, ramyarî û tecrubegirîyê hem di parastina canê xwe da bi ser dikeve hem jî

heyfa birayê xwe hiltîne. Çîroka bi navê “*Navê Însana Bipirse*”yê, çîroka “*Bahlûl Girtîyê Hefta û Bahlûl û Mala Heq û Derewîn*”ê gişt çîrokên Behlûlê Dîwane ne. Çîroka bi navê “*Çîroka Padîşah û Leglegê*”yê, ji hêla mijara xwe ve dirûvdarê hikayetên siyasetnameyî ye. Gava padîşah di pey mirina dêya du kurên xwe da jinekê diîne, huzûra mala wan xerab dibe û her du lawên wî terkiserî dinyayê dibin. Rêzerûdanên bêbextîyê ku li van her du ciwanan bûne, piştî ku nesîbê keçeka bitecrube û çavnas a qiralekî dikeve nav qedera wan, ew bi xwe hemû bêbextîyan di huzûra bêbextan da, bi rê û zê vedibêje, bêbext dihên cezakirin û çîrok diqede.

Ev xebata Dîyarî Asûrê di tanga xwe da lêkolîneka tekane ye ku li herêma Êlîhê hatiye kirin. Wî bi awayê pisporane rasteqînîya devoka çîrokbêjan parastîye û teyîsandîye ser kaxizê. Siberojê lêkolînerek dikare van metnan di biwarê zimannasîyê da jî bi kar biîne. Wê ew bêjeyên ku di metnên çîrokbêjî da derbas bûne; lêbelê ne bi kurmancî ne, yaxud her axiver û xwînerên kurmancî yên îro bi wan nizanin jî di jêrenotan da dane naskirin. Wisa dîyar e ku bi vê xebatê berhemeka din a girîng li cureyê “destan”ên kurmancî û “hikayeyên gel”^{1*} zêde bû. Piranîya van berheman wekî kategori li “edebîyata ciwanan” dihên û ji bo keç û xortên nû bi tecrubeyan mişt dagirtî ne. Berhevkarî ev hemû berhem di nav yek hefteyekê da ji çîrokbêjan wergirtiye. Ev kêmahîyek e. Cihê mixabinîyê ye ku “keşûhewa”ya çîrokbêj jî ne “siruştî” ye; bes germegerma temûzê ye. Heger berhevkarê ev xebata hêja di demsala wê ya siruştî da pêk anîbûya, helbet tehm û ekla vegotina vebêjeran hemin dê xweştir bûya. Bi tevî vî awayî herçiqas wê sicîla çîrokan girtîye jî, wê ji çîrokbêjan ev pirsên giring nekirine: 1) Gelo te ev hikayet *ji kê*; 2) *kengê*; 3) *li ku derê* wergirtiye?

Wekî rexneya dawî ku divê meriv li berhevkarê bike ew e ku wê ji van panzdeh çîrokan 13 ji devê Ebdulezîz Şîmşek wergirtine; tenê 1 çîrokek ji devê Abdullah Kaya, 1 jî ji devê Evdile Koyuncû wergirtiye. Bi qenaeta min ev neheqîyeka mezin e li Şîmşekî. Şîmşek, bi gotina wî hem dengbêj e hem jî çîrokbêj û destanbêj. Heq hebû ku wê bîyografiya Şîmşekî jî li çîrokên wî zêde bikira û ev nav li vê xebata xwe bikira: *Jîyanname û Berhemên Ebdulezîz Şîmşek*. Bi ser vê ra li binî jî ev bigota: Amadekar: Dîyarî Asûr.

1 Helbet ferq di navbera cureyê Çîrok û Hikayeyên Gel da heye. Çawa ku hikayeyên mîna Mem û Zîn, Sîyabend û Xecê, Zembilfiroş û Gulxatûn, Binefşa Narîn, Stî û Fexrî, Gulnaz Xanim û Melo, Tahir û Zuhre û Senem Xanimê ji hêla cureyên xwe yên edebî ve ne çîrok in, ev hikayeya Besam Axa û Lalixanê jî ne çîrokek e û helbet divê ew jî li krîterên edebîyata gel a dinyayê, wekî Hikayeyên Gelî bihên hesibandin.